Rucksack KiTa
Alltagsintegrierte Sprach- und Familienbildung



# *Startklar 2025- Çalakiyên pirzimanî ji bo malbatên xwedî paşxaneya koçberiyê ji bo qûnaxa veguhestina ji baxçeyê zarokan bo dibistana seretayî (Kurmandschi)*

Kommunale
Integrationszentren
NRW

# Agahî ji bo malbatên xwedî paşxaneya koçberiyê

Çalakyên ji bo malbatên xwedî zarok di çarçoveya komkara çentê piştê (AG Rucksack) de, qûnaxa veguhestina ji baxçeyê zarokan bo dibistana seretayî ya kombenda KI NRW, sala 2020 bi piştevaniya pisporî ya LaKI, hatiye amadekirin.

Ji egerê daxwazên zêde, ev belavok li sala 2025 di bin çavan re hat derbaskirin, nûkirkin û ji bo çend zimanên din hate wergerandin.

Ev belavoka ji bo malbatan dixwaze di dema pandêmiya Koronayê de piran ava bike û ev helbet nayê wê wateyê ku ji hemû aliyan ve ya temam e û çênabe jî ku wek cihgirê wan hewldanên dema veguhêz ji bo xizmetgûzariyên giştî were fahmkirin.

Nivîskar: KI Bottrop, KI Duisburg, KI Gelsenkirchen, KI Navçeya Recklinghausen, KI navçeya Viersen, Nivîsîngeha Koordînasiyonê ya seranserî Welat ya Navendên Herêmî ji bo Entegrasyonê li NRW (LaKI), MKFFI NRW 2022

Wêne û nîgar: © MKJFGFI NRW 2025

Bi van zimanan jî li ber derst e:

Albanisch, Arabisch, Bulgarisch, Deutsch, Englisch, Farsi, Französisch, Griechisch, Italienisch, Kurmanci, Polnisch, Rumänisch, Ukrainisch, Russisch und Türkisch.

Kommunale Integrationszentren NRW

# Çalakî bi zarokan re



## Ev ez im û ez dikarim van tiştan bikim

Dema zarokek dikeve dibistanê, hingî ew nû ye li dibistanê, lê bêguman ew ne ne! Ji ber ev bûn 6 salên wî, ew li vê cîhanê ye û di vê demê de ew fêrî gelek tiştan bûye.

## Spartek: Wêneyê bi tebeşîrê „Ev ez im“



Li derve bi zaroka xwe re li cihekî xweşik û rast bigerin, da ku hûn bikaribin li ser baş bi tebeşîrê wêneyan çêbikin. Paşî hûn dikarin wisa bikin:

1) Bila zaroka we xwe li ser erdê dirêj bike û hûn bi tebeşîrê li dora bedena wê xêz bikin.

2) Niha hûn cihê xwe biguherin. Hûn li kêleka wêneyê zaroka xwe dirêj bikin û bila zaroka we li dora bedena we xêz bike.

3) Û niha bi zaroka xwe re li ser biaxivin, çi jê kêm e, û wan jî lê zêde bikin: çav, poz, guh, dev, por, cil ...

4) Navan li ser wêneyê tebeşîrî binivîsin.

5) Bi hev re biaxivin û bêjin hev, ka hûn zêdetir ji çi hez dikin, û wan tiştan li dora wêneyî çêbikin: berf, lîstok, heywan ...

6) Niha jî li ser wê yekê biaxivin, ka her yek ji we di çi de jêhatî ye, û wan jî lê zêde bikin: lîstika goka lingan, gotina stranan, hilkişîn. Li cihê ku mirov wêneyan çêbike, hema mirov dikare bilîze û yê din gerek e texmîn bike, ka ew çi ye.

7) Bi zaroka xwe re li ser wan tiştan biaxivin, ew yên ku hûn hîn dixwazin fêrbibin û wan jî lê zêde bikin û bineqşînin.

8) Li dawiyê wêneyekî xweşik yê wan wêneyan bikişînin. Belkî zaroka we bixwaze wî wêneyî li destpêka dibistanê bi xwe re bibe dibistanê. Ew ji wê re dibe alîkar ku xwe bide nasîn û wê bi ceger dike!

# Spartek: Rojnivîska min „Ez dizanim van tiştan bikim“

Dema ku zaroka we hest pê bike ku erk û xebat pê tên spartin, ew wêrek û bixwebawer dibe. Ev di demekê de, ku tiştekî nû dest pê dike, pir giring e. Bi zaroka xwe re gelekî biaxivin, ka ew dixwaze vê rojê xwe bi çi ve mijûl bike yan ka dixwaze bi çi erkan rabe (Bo nimûne: Avdana gulan, danana sifra xwarinê, alîkarîkirin li dema çêkirina xwarinê yan kêkan ...).




1) Hindeke kaxezên spî bînin û wan wek deftereke biçûk bi hev ve girêbidin yan jî deftereke bê xet ya amade bikirin.

2) Bila zaroka we wêneyekî xwe bi pêşiya wê ve binûsîne û navê xwe li ser binivîse.

3) Li ser wê yekê biaxivin ku ev defter rojnivîska zarokan e. Bila êdî zarok rojane wêneyekî li ser rûpelekî çêbike ka wê wê rojê çi kiriye yan kariye bi tenê çi encam bide. Dê baş be, eger hûn jî tiştekî li ser binivîsin. Ji zaroka xwe bipirsin, ka gereke hûn çi li jêr binivîsin:

   Bo nimûne: Îro min sifreya xwarinê deyna. Îro min skûter hajot. Îro min wêneyekî beharê çêkir.

# Ez ji bo qonaxa nû ya jiyanê „dibistan“ çi bidim zaroka xwe ?



## Spartek: Tûrê dibistanê

Wêneyekî tûrê dibistanê yê vala li ser dîwarekî mala xwe daleqînin û di hefteyên li pêş de heta destpêka dibistanê bi zaroka xwe re ya dike here dibistanê dagirin. Hun dikarin her tiştê ku we di salên borî de dane zaroka xwe, bikin vî tûrê dibistanê yê sembolîk, bo nimûne: hezkirina we ji zaroka we re, bawerî, xwendina pirtûkên wênedar, lîstina gelek, wêne çêkirin û karên destan, hezkirina ji mirovên din û ji heywanan ...

Dê kelek tiştên din werin bîra we!

1) Bila zaroka we ji bo her taybetmendî û çalakiyekê, sembolekê çêbike û ji hawîrdor bibire. Ev e jî çend pêşniyar in:




2) Vî sembolî bi zaroka xwe re bi tûrê dibistanê ve biçespîne. Du yan sê caran di hefteyê de bi zaroka xwe re semboleke nû lê zêde bikin.

3) Bi hev re di gel zaroka xwe demeke rojê dest nîşan bikin, bo nimûne berî razanê û bi hev re li tûrê dibistanê binêrin. Bi zaroka xwe re li ser sembolên li ser tûrê dibistanê biaxivin, ka gelo çi wateya wan ji bo we heye. Bi vî awayî dê zaroka we ji bo derbasbûna „jînwarê nû dibistan“ bihêz be.

# Nimûne ji bo tûrê dibistanê

✂ ji hawîrdor bibirin.



# Rêbername jibo çêkirina tûrê dibistanê




Bi „zaroka xwe ya dibistanê“ re tûrekî dibistanê ji bo roja derbasbûna dibistanê çêbikin!

<u>Tiştên ji we re pêwîst ev in:</u>

1) kartoneke rengîn ya hişik (A1 an A2)
2) qelemrisasek, meqesek, 1m benik
3) kaxeza pêldar ya rengîn û benikekî rengîn
4) qelema şîrazê, şîraza ron yan şîraza dualî
5) kaxeza rengîn ya hişik ji bo xemilandinê

## Rêbername:








1) Kaxeza hişik rast bikin û benikî bi qelemrisasî ve girê bidin.

2) Benikî bi kunca (A) ve girêbidin û bi qelemê kevanekî ji (B) heta bi (C) xêz bikin.







3) Niha hûn dikarin bi zaroka xwe re wê çarêka giroverê di ber kevan re ji hawîrdor bibirin.

4) Niha jî şîraza dualî yan şîraza din li ser aliyekî dirêj yê çarêka giroverê bidin.

5) Kartona hişik bipêçin û bikin tûr. Gereke aliyê tûj ne vekirî be.





6) Parçeyeke kaxeza pêldar ya rastgoşe ji nav de bi tûrikê dibistanê ve biçespînin. Ev rastgoşe 5 cm ji qula deriyê tûrik dirêjtir e û nêzîkî 35 cm bilind e.





7) Tûrê dibistanê bi tiştên zaroka we jê hez dike, bixemilînin. Ji zaroka xwe bipirsin. Bo nimûne: Li ser kaxeza hişik ya tenik tiştên zaroka we gelekî jê hez dike, bineqşînin, û wan ji hawîrdor bibirin û bi şîrazê bi tûrê dibistanê ve biçespînin.

***Demên xweş biborînin*!**

# Rêya dibistanê



**Mirov dikare li ser dibistanê fêrî gelek tiştan bibe**

Herçende ku di vê demê de gelek rê ji bo tirimbêlan têne bikar anîn jî, lê rêya dibistanê ji bo hînbûnê biyavekî gelekî baş e. Zaroka we li ser rêya dibistanê hînî gelek tiştan dibe: ew bi xwe rêberiya xwe bike, dema xwe dabeş bike, ji bo roja dibistanê xwe amade bike, bizane rêya hatinûçûnê bikar bîne û pêgîriyê bi rênmayên giring yên hatinûçûnê bike, cihên metirsîdar nas bike û berî her tiştî xewşiyê jê bibîne, li ber hewaya xweş û paqij bimeşe!

Yê ku bi lingan here dibistanê, ew dê baş û tendirust bimîne, hevsengtir e, bihtir serbixwe ye û hişiyartir e. Dêubavan roleke giring heye, li destpêka dibistanê zarokê bi ewlehî bibin û bînin û jê re bibin nimûneyeke baş.

Di rêbernameyeke berfireh ya rêya dibistanê de, ADAC hemû agahiyên giring (di heman demê de bi zimanekî sivik) li ser destpêkeke ewledar û tendurist ji bo dêubavan amade kiriye: Daxistina belaş li ser vê malperê ye www.adac.de, peyva lêgerînê „Schulwegratgeber” ye.

**Fêrkirina bi hev re gelekî giring e û ewlehiyê peyda dike**

Da ku zaroka we li ser rêya dibistanê ewledar be û rêya xwe baş nas bike, divê hûn zaroka xwe fêrî çûn û hatina li ser vê rêyê bikin. Bi rêkxistî dema xwe terxan bikin ji bo ku hûn li ser rêyê bimeşin û wê baş nas bikin.

Ne her tim rêya herî kurt rêya herî ewledar e. Wê rêyê hilibijêrin ya ku kêmtirîn cihên metirsîdar hene. Ev çend hizir in, ka çawa mirov dikare rahênanan li ser rêya dibistanê û ewlehiya çûnûhatinê bike.

# Spartek: Cilên Ewle



Rengên rohn û teysok ji alyê şofêran ve baştir têne dîtin û ew ewledartir in. Reflektorên li ser cil û çenteyan bi taybetî di demên tarî yên salê de pir hêsan têne dîtin.

Hûn dikarin van rahênanan bi zaroka xwe re bikin:

1) Hûn bi zaroka xwe re cilên tarî li ber xwe bikin û odeyê tarî bikin. Bi hev re biceribînin ka hûn çawa hev dibînin.

2) Niha cilên xwe biguherin û hûn herdu cilên rengê wan rohn an yên teysok bikin ber xwe:  Niha hûn dikarin di tariyê de baştir hev bibînin?

3) Yan jî bi cilên rengê wan rohn/teysok wêneyan bi ronahiya filaşî bigirin û piştî hingî bi cilîn tarî! Kîjan cil li ser wêneyan baştir tên dîtin?

4) Paşî hûn dikarin bi cilubergan lîstikeke ji hev cudakirina cilan bilîzin. Hemû cilên ku di tariyê de baş têne dîtin dê bikevin selikekê de, hemû cilên ku di tariyê de baş nayên dîtin dê bikevin di selika din de.

5) Spartek ji bo zarokê: Cil û çenteyê zarokan wiha birengîne ku ew di tariyê jî de bikaribin baş werin dîtin.

6) Niha bi zaroka xwe re biaxivin, çima lixwekirina cilên rengê wan rohn an teysok wiha giring e.

# Nimûneya cilên ewle



*Cil û çenteyê zarokan wiha birengîne ku ew di tariyê de baş werin dîtin.*

# Spartek: Rêya dibistanê ya ewle



Çend caran bi hev re herin dibistanê. Bi rê de bi zaroka xwe re li ser rênmayan û cihên metirsîdar biaxivin. Hûn dikarin van rahênanên li jêr bi zaroka xwe re bikin:

1) Tebeşîrê bi xwe re bibin û hemû cihên metirsîdar bi tebeşîra sor **!** nîşan bikin. Her tim li ser egeran biaxivin da ku ji zaroka we re zelal be, çima ew tişt wek metirsî hat nîşan kirin.

2) Cara duyê, heke zaroka we karibe, bila ew bi tenê **!** nîşan bike.

3) Cara sêyê hûn dikarin rola xwe li hev biguherin. Niha zarok dayik yan bav e û dê bi rê de hemû rênmayên giring û cihên metirsîdar şirove bike.

4) Zaroka we dikare rêya dibistanê bi we re binexşîne. Bila ew wêne di dema hevpeyvînek de çêbibe: „Te çi bi rê de dît? Kîjan cihên metirsîdar li ser rêyê hene? Tu ji kîjan cihên li ser rêyê gelek hez dikî? Gerek e em çend caran derbasî aliyê dinê cadeyê bibin? Gerek e li destpêkê em ber bi kîjan alî ve bimeşin?“

Di çûnûhatinê de gelek giring e ku pêgîrî bi rênmayyan bê kirin. Hûn dikarin van rahênanan bi zaroka xwe re bikin:


1) Rahênanan li ser van rênmayan bi awayekî rist û bestan bikin, weha dê zaroka we wan çêtir bibîr bîne:
„Li sorî biwestin, li keskî bimeşin.“
„Jîr be û baş bîn be.“
„Ji ber ku dixwazim herim aiyê din yê rê, ez, lewma divê pêşî li milê çepê, rastê careke din çepê binerim, ez.“
„Her zarokek vê yekê jî dizane, ku ji bo çûnê rêya peyada heye.“

Rênma di heman demê de bi stranên li ser rênmayên çûnûhatinê jî baş bibîr tên, bo nimûne strana cudahiya di navbera çep û rastê de ya Rolf Zuckowski. Bi hev re guhdarî bikin, bo nimûne li ser YouTube û pê re bistirînin.

Hûn dikarin li ser malpera fermî ya Rolf Zuckowski hemû stranê bi têkst ji bo daxistinê peyda bikin:

https://www.musik-fuer-dich.de/liedtexte/l

# Spartek: Lempeya trafîkê



Rengên kesk û sor di çûnûhatinê de pir giring in.

Hûn dikarin van rahênanên li jêr bi zaroka xwe re bikin:


1) Bila zaroka we lempeya trafîkê ya jêrîn bi rengên sor, zer û kesk birengîne.

2) Niha jî bi hev re hizra livînan bikin (xwe helavêtin li ser lingekî, bazdan, reqisîn, qeşmer...).

3) Tiliya xwe ber bi xeleka kesk ve bibin, bi zaroka xwe re dest bi livînê bikin. Heger we paşî tiliya xwe ber bi xeleka zer ve û piştra yekser ber bi ya sor ve bir, gerek e êdî livîn were rawestandin.

4) Niha hûn dikarin rola xwe li hev biguherin! Ji zaroka xwe re şirove bike, ku divê mirov li ser nîvê cadeyê nesekine, divê mirov zû here, xwe heke lempeya trafîkê sor jî bibe!

# Nimûneya Lempeya trafîkê



*Lempeya trafîkê bi rengên sor, zer û kesk birengîne.*

# Links für vertiefende Hinweise:

**Wichtige Links, zuständige Ansprechpersonen sowie Informationen zum Bereich Herkunftssprachlicher Unterricht**

🔗https://www.bra.nrw.de/bildung-schule/unterricht/integration-durch-bildung/herkunftssprachlicher-unterricht-hsu

**Mehrsprachiges Informationsmaterial zum Thema „Die Schule NRW?“**

🔗https://broschuerenservice.nrw.de/default/shop/willkommen-in-nrw.-deutsch-arabisch-fur-grundschulkinder|324

**Mehrsprachiges Informationsmaterial zum Bildungs- und Teilhabepaket:**

🔗**Deutsch:** https://broschuerenservice.nrw.de/default/shop/bildungs-und-teilhabepaket|578#image-1949

🔗**Arabisch:** https://broschuerenservice.nrw.de/default/shop/bildungs-und-teilhabepaket.-arabisch|580#image-1957

🔗**Türkisch:** https://broschuerenservice.nrw.de/default/shop/bildungs-und-teilhabepaket.-turkisch|583#image-1969

🔗**Russisch:** https://broschuerenservice.nrw.de/default/shop/bildungs-und-teilhabepaket-russisch|581#image-1961

Wir möchten Sie zudem auf das nun mehrsprachige Familienportal des Landes NRW hinweisen. Unter folgendem Link finden Sie viele wichtige Informationen u.a. für Familien.

🔗https://www.familienportal.nrw/de



***Em ji bo vê yekê ji we û zaroka we re serkeftin û kêfxweşiyê dixwazin!***